

SERKEFTIN

www.tevgerakomunist.com

Hejmar: 05

Dîrok: Tîrmeh 2022

DENGÊ ŞOREŞ Û AZADIYÊ

Di Salvegera 10'emîn de Bijî Şoreşa Me Ya Rojava



في الذكرى العاشرة عاشت ثورة روج آفا

Em di pêvajoya pîlanên êrîşên berfireh ên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûrî ber bi salvegera 10'emîn şoreşa 19'ê Tîrmehê ve diçin. Şoreşa Rojava ya ku wek şoreşa jinê jî hebûna xwe diparêze bi xetereyê mezin rû bi rû ye. Dewleta Tirk a dagirker ji bo ku pîlanên xwe yê dagirkirina çar parçeyên Kurdistanê û tevahî herêmê ser bixe niha di tevgerê navnetewî de ye. Di vê serdema ku pergala kapitalîzm û emperyalîzmê li seranserê cîhanê di nav qeyraneke mezin de ye şoreşa Rojava bi yekîtiyê û wekheviya tevahî gel û netewên herêmê rê nîşanî tevahî gelên bindest dike.

Ji ber vê yekê îro erka me û tevahî jin, ciwan û pekhatyên şoreşê ew e ku em şoreşa xwe biparêzin. Em ê di 10'emîn salvegera şoreşa xwe de li dijî hemû êrîşên mêtîngêriyê berxwedanê mezintir bikin. 10'emîn salvegera avakirina şoreşa me ya Rojava ji tevahî welatparêz û şoreşgeran re pîroz be! Di salvegera 10'emîn de bijî şoreşa me ya Rojava!

نحن نقرب من الذكرى العاشرة لثورة 19 تموز في إطار خطط الغزو التركي المكثف للدولة التركية على روج آفا ، شمال وشرق سوريا. إن ثورة روج آفا التي تدافع عن وجودها كالثورة النسائية تواجه خطراً كبيراً. الدولة التركية المحتلة الآن في حركة دولية من أجل النجاح في خططها بأحتلال أربعة أجزاء من كردستان والمنطقة بأكملها. في هذا العصر الذي يمر فيه نظام الرأسمالية والإمبريالية بأزمة كبيرة في جميع أنحاء العالم ، توضح ثورة روج آفا الطريق لجميع الشعوب المضطهدة مع الوحدة والمساواة بين جميع شعوب المنطقة.

لذلك واجبنا اليوم وكل النساء والشباب والثوار حماية ثورتنا. في الذكرى العاشرة لثورتنا ، سنزيد من مقاومتنا لكل الهجمات الإرهابية. نبارك الذكرى العاشرة لثورة روج آفا لجميع الوطنيين والثوار. عاشت ثورة روج آفا في الذكرى العاشرة

2 ROJEV: Di salvegera 10'emîn de...

3 JÎN: Navê Azadiya Jinê: Rojava

4 BÎRDOZÎ: Şoreşa Rojava; Dergeha Azadiyê

5 HEVPEYVÎN: 'Em Şervan û Parezvanên Şoreşa Rojava û Bakurê Sûriyeyê Ne'

Di salvegera 10'emîn de Em Şoreşa Rojava Bi Bîrdariyeke Sosyalîst û Komunîst Rêxistin Bikin û Biparêzin

Şoreşa ku di dîroka 19'ê Tirmeha 2012'an de li Kobanê gava yekemîn hatiye avêtin 10 salên xwe li paş xwe dihêle. Şoreşa Rojava ku wek dijmêtînger û azadîxweziya jin dest pê kiriye belavî axên ku bi piranî gelê Ereb tê de jiyân dike jî bû. Li ser vê esasê vegeriya serweriyeke ku gelên bîndest bi hev re şer dikin, bi hev re jiyân dikin, bi hev re rê ve dibin. Divê em bidin xuyakirin ku berxwedana Kobanê û serkeftina ku di dewamiya wê de hatiye bi dest xistin bîngeha vê veguherînê ye.

Kantonên ku di destpêka şoreşê de derketin holê niha gîhaştine avahiyeke navendî. Pergala Rêveberiya Xweser bi artêşa xwe ya navendî, bi pergala perwerde, polîtîqaya aborî, xebata dîplomasî, bi rêxistina jin, bi gelên netewî yên cûda û bi yekîtiya baweriyên cûda gîhaşt formekê. Ev pêşketineke girîng e.

Lêevastaku hatiye gîhaştin bû sedemaku dijminên şoreşê rewşa xwe ya mawcûd biguherînin. Êrîşên dewleta Tirk a faşîst û mêtînger bi piştgiyariya hêzên koalîsyonê ya rasterast zêdebûn. Emperyalîstan li ser axên Rêveberiya Xweser baregeh ava kirin, li ser sînoran noqte ava kirin, devriye avêtin. Divê bê diyarkirin ku çînen civakî hîna hebûna xwe berdewam dikin û ev normal tê dîtin, avahiya kapîtalîst ku pirsgrîkên zayendî li ser bilind dibin hîna bi rêjeyeke mezin hebûna xwe berdewam dike.

Li dijî êrîşên dewleta Tirk a faşîst û mêtînger ku bi êrîkirina Emerîka û Rûsya rêxistin kiriye gelê me, artêşa me, şoreşgerên komunîst û enternasyonal bi rihekî canfida li ber xwe dan û şer kirin. Gel, komunîst û şoreşgerên Tirkîyê û Bakurê Kurdistanê rabûn serhildanê. Ciwanên welatperêz ên sosyalîst ên Kurdistanî û Tirkîye bi hamleya "Me bi hev re parast em ê bi hev re ava bikin" di navbera şoreşa Rojava û şoreşa Bakurê Kurdistanê û Tirkîyê de pir avakirin. Hêjeye were bîrxistin bi êrîşeke ku dewleta Tirk li dar xistiye 33'ê çalakvanên komunîst li Pirsûsê hatin qetilkirin. Dewleta Tirk ku ji ber şoreşa Rojava tirseke mezin xwar li bajarên Bakurê Kurdistanê û Tirkîyê komkujiyên nû çêkir, bi awayekî girseyî hêzên şoreşger, demoqrat û hwd. xist zindanan. Di ev 10 salên ku em ê li paş xwe bihêlin de Emerîka, Rûsya û hêzên koalîsyonê bi hebûnên xweyên li ser axên şoreşê wek nûnerên kapîtalîzm û emperyalîyetê bi awayekî vekirî eşkere dikin ku ew berpirsiyarên êrîşên li dijî welatê Rêveberiya Xweser in.

Em di xeteke welatperêziya sosyalîst de bi asoyeke komunîst şoreşê biparêzin û li ser erkên avakirinê kûr bibin

Pergala Rêveberiya Xweser di aliyekî de li dijî êrîşên dagirkeriyê şerê parastinê dide, di aliyê din de jî xebatên avakirinê berdewam dike. Di her qadan de qasî serkeftinan, xalên bi ser neketin an jî dereng man jî çêbûn. Bi xebateke ku ji serkeftinan hêz digire û ji aliyên ne serkeftî jî encaman derdixe pêwîst e giranî bê dayin rêxistinbûnê.

Şoreşa Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûrî di 10 salan de di çaresarkirina pirsgrîkên netewî û bawerî de gavên gelekî mezin avêtin. Lê pirsgrîkên zayenda civakî û çîni ku çavkaniya xwe ji kapîtalîzmê digirin tevahî giraniya xwe didin hêskirin. Di roja me ya îro de çavkaniya pirsgrîkan a rastî ku Rêveberiya Xweser rû bi rû dimîne jî ev e. Lewma pergala Rêveberiya Xweser, ji rêveberiya polîtîk heta dîplomasîyê, ji aboriyê heta eniya azadiya jin, di her eniyê de divê têkoşîna li dijî kapîtalîzmê ku êdî gîhaştîye asta pirsgrîkeke guncaw bike mijara nîrxandinê. Li welatê Rêveberiya Xweser ger ku têkoşîna li dijî

kapîtalîzm û emperyalîyetê wek rêxistinî, teorik, bîrdozî û polîtîk di bîngeheke sosyalîst û komunîst de nede parastin sekna şoreşger a iqtidara polîtîk her ku diçe wê zahmetir bibe. Şoreşa Rojava di vî milî de divê êdî xwe di dahûreneke raxneyî re derbas bike.

Li welatê Rêveberiya Xweser parzvanên kapîtalîzmê yên esasî hêzên emperyalî û mêtînger in. Wek ku tê zanîn dema dagirkirina dewleta Tirk a li Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî rola ku hêzên emperyalî lîstîye gelekî xeternak e. Em nikarin ji bîra bikin ku di serî de Emerîka, Rûsya û hêzên koalîsyonê çî qasî zor lê kirin ku serweriya demokratîk, şoreşger a Rêveberiya Xweser xwe radest bike. Rêveberiya Xweser li dijî vê sekneke şoreşger nîşan da. Ji bo parastina axên xwe yên azad rêya berxwedan û şer danî pêşiya xwe. A rast jî ev bû. Lê ji ber newekheviya hêzan, konjonktûr û hinek pêker bi hinek lawaziyên Rêveberiya Xweser ve bûn yek û ji ber vê yekê di şer de bi rêjeyeke girîng windakirina axên şoreşê hat jiyankirin. Di milê polîtîk û bîrdozî de kemasiyên gel û artêşa gel ên li dijî hêzên dagirkeriyê di gelek aliyên de bû mijara nîrxandinan. Raxne hatin kirin, raxnedayin hatin dayin. Lê di van nîrxandinan de qet bal nehat kişandin ser lawaziya rêxistinbûn û lawaziya bîrdariya antîemperyalîst (dijemperyalî) û antîkapîtalîzmê (dijkapîtalîzm).

Em di pêvajoyên ku êrîşên nû yên dagirkeriyê tînan pîlankirin re derbas dibin. Ji bo ku rewşeke hevşib neyê jiyankirin pêwîst e gel û artêş bi bîrdariyeke welatperêziya sosyalîst bînan ronîkirin. Ji ber ku em rewşa mawcûd tenê bi pergala Rêveberiya me ya Xweser ku xeteke welatperêziya sosyalîst de rêxistin bûye dikarin bikin qiraseya pêngavên şoreşgertî. Lewma ji bo azadkirina axên di bin dagirkeriyê de, ji bo vala derxistina pîlanên dijmin destpêkê de divê naverok û rêbazên têkoşîna li dijî pergala kapîtalîst, emperyalîst û hêzên kûrewî di ber çav re bê derbaskirin.

Di 10 salan de em gîhaştin çî astê, di pêvajoya pêş de divê ji bo çî bê têkoşînkirin?

Li Rojavayê Kurdistanê û axên Bakur û Rojhilatê Sûrî pergala Rêveberiya Xweser rêxistinbûna xwe her ku diçe hîna navendî dike. Pergala Rêveberiya Xweser wek kantonan di salên şoreşê yên despêkê de hatine îlankirin ji hev cûda dihatin rêxistinandin em dikarin bêjin di roja me ya îro de gîhaşt asteke navendî. Rêxistinbûn û rêveberiyên di qada siyasî, leşgerî, aborî, dîplomasî, perwerde, çand û hwd. bû navendî. Ji aliyekê ve vegeriya "dewleteke ku ne dewlet e"

Di pergala Rêveberiya Xweser de di qada civakî de têkîliyên çîni ku eydî pergala kapîtalîzmê ne bi awayekî bi bandor hebûna xwe berdewam dikin. Di têkoşîna azadiya jinê de sedema esasî ya çaresar nebûna pirsgrîkên ku rû bi rû tê mayin ew e ku çîn, eşîr, bawerî hîna xwedî îmtiyazî ne ku ji pergala kevin de anîne.

Li Rojavayê Kurdistanê ENKS'ê ya hevkar û dijî şoreşê ye, bi pêşengtiya Emerîka bi taybetî hewl dide ku xwe bi rêxistin bike. Tê xwestin ku ev hêza ku li dijî şoreşê ye bê qanûnîkirin. Ev xebat car caran bisekine jî hîna berdewam e. Gaveke bi vî rengî dê deskeftiyên şoreşa me têxe xeterê. Ev rêxistina burjuva, netewperest, hevkar û dij şoreşê rola hespê troyayê kapîtalîzm û emperyalîzmê dilîze.

Pêwîst e hebûna dewletên emperyalî wek pirsgrîka herî cidî bê dîtin û nîrxandin. Di pergala Rêveberiya Xweser de di milê berdewamkirina nakokiyên çîni, netewî û cinsî de bandoreke girîng a van hêzan heye. Hêzên koalîsyonê li welatê me nûnerên kapîtalîzmê ne. Hebûna çînen kapîtalîst diparêzin. Bi rîya munazamayan

li welatê Rêveberiya Xweser aboriya kapîtalîst û xeta polîtîk ku vê pêwîst dike, çanda burjuvayî û têkîliyên wê hem zindî digirin hem jî vê bi rêxistin dikin.

Li welatê Rêveberiya Xweser em wek dijmin tenê DAİŞ'ê derxin pêş em ê di têkoşîna xetereyên ku me li jor hijmartine û di milê ronîkirina gelê xwe paş de dimînin.

Di van 10 salan de bûyera ku herî zêde li pêşketina pergala Rêveberiya Xweser bandor dike bîguman bi rêjeyeke mezin berdewamkirina çînan e. Ev heta cihekî tê fêmkirin. Erkên şoreşa dijmêtîngêrî û azadîxweziya jin û erkên îro bîguman ne weke hev in. Lê li ser şiklê hebûna van çînan di nav civakê de cûdatiyên çîni zêde dibin. Di nav gel û rêveberiyê de ferqa tebeqî bilind dibe. Lewma rewşa mawcûd di rêya teorîya komunîst de stratejî û rêxistinbûneke welatperêziya sosyalîst nîşan dide.

Têkoşîna sosyalîst û komunîst bîguman bi rêya partiya komunîst tê rêxistinandin û rêvebirin. Lê li welatê Rêveberiya Xweser tenê bi partiya komunîst destgirtina vê têkoşînê şaş dibe. Divê ev têkoşîn di heman demê de bi destê serweriya heyî bê meşandin.

Îro li çîhanê pergala serwer pergala kapîtalîzmê ye. Welatê Rêveberiya Xweser ji aliyê pergala kapîtalîzmê ve nayê qebûlkirin. Qîma xwe bi vê naynin. Hêzên kapîtalîst, emperyalîst û hêzên kûrewî û dewletên kapîtalîst ku ew bi rê ve dibin dixwazin teşeya hebûnê ya siyasî biguherînin. Di xebatên ku heta niha hatiye meşandin de ev rastî hat dîtin. Dagirkerî mînakê vê ye. Berdewamkirina deh salan a amborgoya aborî û hewildana qanûnîkirina ENKS'ê xebatên girêdayî vê rastiyê ne.

Komunîstan ji destpêkê de heta niha di nav şoreşa Rojava de cih girtin. Şehîd dan. Îro jî di xeteke welatperêziya sosyalîst de xebatên xwe berdewam dikin. Ji pê ve her cure piştgiyariyê didin rêxistinbûn û xebatên demokratîk ên Rêveberiya Xweser û vê piştgiyariya xwe berdewam dikin.

Şoreşa Rojava di heman demê de li Efrîn, Girê Spî û Serê Kaniyê nikarîbû windakirina axên xwe asteng bikiraya. Pêwîst e li ser sedemên vê bê sekinîn. Bi taybetî pêwîst e di van pêvajoyan de em bal bikîşinin ser kemasiyên gel û artêşê. Derfetên kêmbûna çekên teknolojîk û pêşketî yê artêşa me bîguman girîng e. Lê ya ji vê hîna girîngtir kêmasiya gel û artêşê yên di oxira welatekî azad de bi fîdayî li ber xwe dayin û şerkinê de derketine holê ne. Di van deh salan de tiştê ku hatine jiyankirin û kemasiyên ku derketine holê kêmasiyên rêxistinandin di nav gel û artêşê de bîrdariya dijkapîtalîst û dijemperyalîst nîşan dide. Bi rêxistinbûnên mawcûd ên dijkapîtalîst û dijemperyalîst nîşan dide ku derketina derveyî kapîtalîzmê û emperyalîzmê ne bi derfet e. Pêwîstiya kirdeyê pêşeng a komunîst tam di van deman de derdikeve holê.

Pergala kapîtalîst û emperyalîst îro di her alî de xwîn diherikîne û wek her tim bi xwînê xwedî dibe. Birçitî, xizantî, mirin li her derê heye. Pergala kapîtalîst, hêzên kûrewî yên emperyalî, desthilatên mêtînger berpirsiyarên vê rewşê ne. Hêzên emperyalî yên kûrewî di nav qeyraneke mezin de ne. Ev qeyran bandor li welatê Rêveberiya Xweser jî dikin. Welatê Rêveberiya Xweser di nav vê qeyrana ku çîhanê dihejîne tenê bi derçûnên şoreşger ên nû dikare xwe biparêze û dikare bi vê rêyê hêviyên nû yên şoreşger bide gelên çîhanê.

Li dijî kapîtalîzmê komunîzm, li dijî hemû desthilatiyên çîni û zayendperest sosyalîzm rîya tekane ya ji nû ve rizgariya mirovahiyê ye.

NAVÊ AZADIYA JINÊ: ROJAVA

Şoreşa Rojava ya jinê şoreşeke ku hemû jin xwe ji nû ve diafirînin û tecrûbeyê têkoşînê ye ku hêzê dide hemû jinên cîhanê. Pêkanîna şoreşên jinan li erdnîgariyên xwe wê hem şoreşa Rojava ya jinê mezin bike û hem jî hebûna wê misoger bike. Îro em ber bi salvegera şoreşa xwe ve diçin. Yekane şertê mayindebûna şoreşa jinê ew e ku li her derê deng bide.

Weke ku komunîstan di bernameya xwe de diyar kiribûn, sedsala 21'emîn weke serdema şoreşên jinan pêş dikeve. Li seranserê cîhanê di sedsala 21'emîn de serhildan û serhildanên jinan pêk tên. Di roja me ya îro de jin bi awayekî sistematîk tên qetilkirin û ji bo desthilatdariya zilaman pergala zêdetir tê xurtkirin. Serdestiya zilaman ku çavkaniya pirsgerêkên civakî ye derbas bibe, wê bibe sedema çareseriyê pirsgerêkên jinan û bi vî rengî pirsgerêkên civakî. Şoreşa Rojava ya ku bi feraseta azadîxwaziya zayendî hatiye avakirin, weke xetere tê dîtin û êrîş tê kirin. Ji ber vê yekê di serî de vîna jinê tê hedefgirtin. Di her kêliya dîrokê de em dibînin ku ji bo bidestxistina şoreşê di serî de êrîşî destkeftiyên jinan tê kirin. Armanca dewleta Tirk a dagirker û dewletên paşverû yên herêmê îro jî ew e. Ji bo jin vegere rola xwe ya kevneşopî ya beriya şoreşê, ji aliyê ENKS'ê ve hewl hat dayîn ku li ser nûnertiya wekhev, hevserokatî, ziman û çanda Kurdî nîqaş bîn kirin û ji şoreşê hat xwestin ku gavekê paş bavêje. Di heman demê de weke êrîşên îdeolojîk ên li dijî şoreşa jinê bi polîtîkayên şerê taybet jinên pêşeng hatin hedef girtin.

Armanca sereke ya şerê taybet ew e ku pergala ku Şoreşa Rojava ya jinê ava kiriye û rêxistinbûna jinê belav bike. Ji vî alî ve polîtîkaya êrîşa li ser tevgera jinê ya birêxistinîkirî bi riya kuştinê, qetilkirinê tê meşandin. Hevseroka MSD'ê Hevrîn Xelef, rêveberên Kongreya Star a Kantona Kobanê Zehra Berkel û Hebûn, Hind û Saade yên di meclîsa jinan a Şedadê de dixebitîn, rêveberên Yekîtiya Jinên Ciwan ên Rojava li Kobanê hatin qetilkirin. Bi taybetî jî tê xwestin bi vî qetlîamê pêşî li tevlibûna têkoşîna azadiyê ya jinên Erebbê girtin. Tê xwestin ku hemû jinên ku di avakirina şoreşê de cih girtine bitirsînin û wan ji şoreşê dûr bixin.

Ji van qetlîaman yek jî ne tesadufî ne, bi awayekî taybet tên kirin. Armanca wê di nav şoreşê de tunekirina pêşengtiya jinan e. Rojava şoreşeke jinê ye ku bandorê li hemû cîhanê dike. Şoreşe jinê divê bi şoreşa civakî re bimeşe. Pêwîst e li dijî civaka navneteweyî, herêmî û serdestiya bavixsalar a ku li dora wê hatiye dorpeçkirin, têkoşîneke hemwext bide meşandin. Şoreşa Rojava ya jinê hêviya hemû jinên cîhanê ye. Di heman demê de her ku mezin dibe hêzê dide tevgerên jinan. Ji ber vê yekê ji aliyê dijminan ve jî weke metirsî tê dîtin û dibe hedefa êrîşan. Ev êrîş carinan rasterast, carinan jî li ser

bingeha hêzên hevkar tên kirin. Lê belê armanc tunekirina vîna û destkeftiyên jinan e. Em dikevin 11'emîn salvegera Şoreşa Rojava. Şoreşa Rojava ji tarîtiyê re bû ronahî û ji bo jinan û gelan bû hêviyek. Bêguman Şoreşa Rojava ku îlhamê dide jinên hemû cîhanê di heman demê de şoreşa jinê ye. Helbet şoreşa jinê ne tenê tê wateya tevlibûna çalak a jinê ya jiyane. Di hemû mijaran de bêdadiya civakî, pirsgerêkên ekolojîk, qeyranên aborî, nebûna perwerdeyê, ya herî girîng parastina li dijî dagirkeriyê û avakirina şoreşê, balê dikişîne li ser vîna jinê. Avakirina pergala xweseriyê demokratîk, avakirina pergala hevserokatiyê û temsîliyeta wekhev, qedexekirina zewacên zêde û zewaca temenê biçûk, avakirina artêşa jinan, di hevpeymanîya civakî de bidestxistina mafên jinan destkeftiyên şoreşa deh salî ne. Di heman demê de ji bo



ji holê rakirina bermahiyên rejîma BAAS a bavixsalar û zordar di hemû rêxistinên weke komîn, meclîs û mekanîzmayên edaletê de, ji bo guhertin û veguhertina siyasetê jinan cihê xwe di her rêxistinê de girt, di qada jiyane û siyasetê de, rastiya Şoreşa Jinê careke din derxistin holê.

Şoreşa Rojava, pêvajoyeke ku di dîroka têkoşînê şoreşgerî yên cîhanê de cih girt û hê jî didome, ji pêvajoyên şoreşgerî yên heta niha hatine vegotin xwedî taybetmendiyeke cuda ye. Weke şoreşa jinê, Rojava hemû tecrûbeyên şoreşgerî yên ku bi parastina azadî, wekhevî û edaletê dest pê kirine, ji berê heta niha mîras girtiye. Şoreşa Rojava modeleke şoreşê ye ku ev yek bi perspektîfa îdeolojiya azadiya jinê re kiriye yek. Ji ber vê yekê di ev rojên ku em ber bi salvegera şoreşê ve diçin divê jin bi hev re li dijî hemû dijberên şoreşê têbikoşin.

Jinên ku şoreşa Rojava pêk anîn, dikarin şoreşên nû yên jinan biafirînin. Ji ber vê jî Şoreşa Rojava ya jinê di hedefa dewletên paşverû yên herêmê de ye. Ji ber vê yekê li Efrîn, Serê Kanîyê û Girê Spî yên dagirkerî jin dibin hedef. Sala 11'emîn a şoreşê hem ji bo rizgarkirina xakên me yên dagirkerî û hem jî ji bo parastina her cihê ku em tê de ne, wê bibe sala nû ya têkoşînê. Perspektîfa parastina destkeftiyên Şoreşa Jinê û belavkirina şoreşê li tevahiya Rohilata Navîn ji malan dest pê dike, weke erkeke heyî li pêşiya me ye. Ji bo vê jî em ê rêxistinbûna xwe li her qadê mezin bikin û şoreşa xwe biparêzin.

Şoreşa jinê ya ku li Rojava pêk tê, ji bo jinan weke dibistaneke mezin berdewam dike. Dijminên şoreşê ji bo têkbirina vê şoreşê û vîna jinê di her derfetê de êrîşên xwe didomînin. Di sala 11'emîn a şoreşê de em jin li her cihê ku lê bin ji bo mezinîkirin û parastina şoreşê têbikoşin. Heya jinên berxwedêr û ji şoreşa jinê bawer dikin li çiya, li bajar, li qadan, li mal û kolanan hebin û têbikoşin wê teqez azadî bi ser bikeve. Sedsala 21'emîn jî wê li Rojava weke serdema şoreşên jinan pêş bikeve.

ku ew ê weke jinê şoreşê li hemberî hemû gef û êrîşan biparêzin. Li ser navê CKŞ'ê Destan Serhed bi bîranîna Zîlan Destan dest bi axaftina xwe kir. Diyar kir ku ew şoreşgerî û jiyana Zîlan Destan ji xwe re mînak digirin. Destan Serhed diyar kir ku Zîlan Destan bi Şoreşa Jinê ya Rojava re xwe ji nû ve afirand û ji Elende veguherî Zîlan. Di dawiya axaftina xwe de bang li hemû jinên ciwan kir ku li ser şopa Zîlan Destan xwe bi rêxistin bikin û azad bibin.

Semîner bi pêşkêşkirina awazên Koma Zîlan bi dawî bû.



JKŞ û CKŞ'ê li Hesekê

ji bo Zîlan Destan semînerê li dar xist

JKŞ û CKŞ'ê ji bo Zîlan Destan a di 13'ê Hezîranê de şehîd ketibû semînerê hevpar li dar xist. Semînera ku jiyana Zîlan Destan û rola jinên ciwan di şoreşê de hate vegotin, bi sînevîzyon û strana Koma Zîlan bi dawî bû.

Li ser navê JKŞ'ê Fadya Sîdo axîvî û bal kişand ser guhertin û kirdekirina jinan. Sîdo anî ziman ku jinan ji destpêka şoreşê ve li her qadê cihê xwe girtine, li dijî hemû rolên ku kapîtalîzm, feodalîzm û rejîma BAAS ji jinan re danîne têkoşin kirine. Sîdo diyar kir ku pêşengên vê yekê jinên ciwan bûn. Sîdo da zanîn ku ked û rengê jinê di şoreşê de li komun û meclîs, sazî û her derê di qada leşkerî û civakî de xwe dide der û diyar kir ku îro divê jin li hemberî hemû êrîşan bi erka parastina şoreşê zêdetir şoreşê hembêz bikin.

Sîdo da zanîn ku jin bi şoreşê re beşdarî têkoşîna azadiyê ya netewî û zayenda xwe bûn û got ku divê asta ku li Bakur û Rohilata Sûriyeyê hatiye bidestxistin û destkeftiyên Şoreşa Jinê bîn parastin. Sîdo anî ziman ku divê hemû jinên Rohilata Navîn û cîhanê piştgiyê bidin vê têkoşînê û di dawiyê de soza azadkirina xakên dagirkerî da. Wê diyar kir

Şoreşa Rojava; Dergeha Azadiyê

Di 19'ê Tirmehê de em ê 10'emîn salvegera Şoreşa me ya Rojava pîroz bikin. Ji 2012'an vir de şoreşa me ya ku weke şoreşa azadiya gelê Kurd dest pê kiriye ber bi şoreşa gelên herêmê ve çû û îro jî ev wesfa wê mîsoger bûye. Şoreşa me ya demokratîk, gelparêz û azadîxwaziya jinê li gel êrîşên leşgerî û aborî îro bi vîna xwe ya azad meşa xwe didomîne. Şoreşa me di Rojhilata Navîn û Kurdistanê de deriyê azadiya gelan e.

Di pergala emperyalîzma kûrewî de karker di asta herî jor de xizan dibin, resmalîyên biçûk û gundiyan biçûk bi lez bê mal û milk dibin û vediguherin hêza kar a erzan. Serweriyên faşîst ji bo ku karibin welatê xwe ji talana emperyalîzmê re vekin mafên demokratîk ku ji hêla bindestan ve hatine bidestxistin bi zilm û zordariyê desteser dikin. Ji ber polîtîkayên emperyalîstên mêtînger û serweriyên paşverû gelên Rojhilata Navîn bi birçîbûnê ve rû bi rû man, resmalîyên biçûk û hêzên hilberîner ên biçûk bi lez heyinên xwe wenda kirin. Li gel vê serweriyên paşverû erkên xwe veguherandin dîktatoriyên malbatî û xwestin ku hemû welat veguherînin milkê xwe yê taybet.

Dema ku mirov li dîroka dewletên Rojhilata Navîn dinehêre bi hêsanî dikare bibîne ku sînoren wan bi destê mirovan çêkirî ne. Emperyalîstan di Şerê Yekemîn ê Parvekirina Emperyalîst de Rojhilata Navîn par ve kirin û ji bo ku karibin mêtîngerîya xwe mîsoger bikin ji binyatên kevnare sîd girtin. Ango, ji çend eşîr û qebîleyan dewlet ava kirin an jî hevkarê xwe weke şah tayîn kirin. Di van dewletan de ne pêkan bû ku gel dikaribin bi azadî jîyan bikin. Gelek netew û komên netewî hatin parçekirin, koçberkirin û qirkirinên netewî pêk hatin. Hîna jî li Rojhilata Navîn gelek netew û komek netewî êşa van qirkirinan dikişînin, hin ji van gelan di bin metirsiya tunebûnê de ne.

Tevgera me pîrsgirêka esasî û bingehîn a Rojhilata Navîn weke pîrsgirêka bidestxistina azadiya polîtîk pênase dike. Li Rojhilata Navîn bi taybet jî li dewletên paşverû yên ku Kurdistanê mêtînkirî dikin bi pergala faşîst û milîtarîst serweriya mêtînger tene meşandin. Di 2011'an de li dijî van pergala paşverû serhildanên gelên Ereb dest pê kirin. Her ku çû hemû gel û netewên bindest li hemberî serweriyên faşîst û dîktator serî rakirin. Ev serhildan di heman demê de li dijî mêtîngerîya sermiyanî û aborî ya emperyalîzmê û kapîtalîzma hevkar pêk hatin. Di nav van serhildanan de tenê li

Rojava şoreşeke azadîxwaz, gelparêz, demokratîk û azadîxwaziya jinê pêk hat. Şoreşa me ya Rojava li hemberî her du xetên paşverû eniya sêyemîn a gelan vekir û daxwaza azadiya polîtîk û demokrasîyê bilind kir. Di destpêka serhildana gelên Sûriyeyê de di encamê de du xetên paşverû derketin holê. Yek, rejîma BAAS a ku Rojavayê Kurdistanê di bin nîra mêtînger de talan kiribû, gelên Kurd tune hesabandibû, serweriya malbata xwe û mezheba xwe li ser gelan ferz kiribû. Ya duduyan jî komên çete yên cîhadîst, hov û paşverû û dewletên piştgirên wan bû. Şoreşa me ya Rojava her du xetên paşverû weke qedêr nedît û bi hêza xwe ya cewherî eniya sêyemîn vekir. Berxwedana di pêşengtiya YPG û YPJ'ê de hat avakirin di Kobanê de DAÎŞ'a ku tu hêz heta dewlet jî nikarin xwe li ber bigirin şkenand, têk bir û pêvajoya wê ya hilweşînê da destpêkirin. Bi serkeftina



Kobanê çawa ku binketina DAÎŞ'ê dest pê kir di heman demê de tevlebûna girseyî ya nav şoreşê ya gelên herêmê jî bi leztir bû.

Şoreşa me di bin ambargoyê de û di nava şer de xwe ava kir. Azadiya netewî ya gelê Kurd bi dest xist. Veguherî şoreşa gelên herêmê û ber bi qadên Bakur û Rojhilatên Sûriyeyê de berfireh bû. Di bin serweriya şoreşa me de her netew, komên netewî, zayend û bawerî xwedî azadiya kamil in û di bin tu mercan de nabe ku ev azadî werin kêmxistin. Di şoreşa me de jin di her asta jîyan, xebat û rêvebirinê de xwedî wekheviya kamil e û di heman demê de bi rêxistinbûnên xwe yên xweser destkeftiyên xwe mîsoger dike. Jiyan li ser esasê parastina xwezayê tê avakirin. Serweriya şoreşê di rîya komun û meclîsan re ji jêr heta jor bi gel û nûnertiyên wan ên rêxistinbûyî re tê rêxistinîkirin. Dîsa di serweriyê de temsiliyeta jin, ciwan, netew, komên netewî, ol û baweriyên di makezaganan de parastî ye. Hemû gel di saziyên civakî, pîşeyî, hunerî, aborî û serwerî de

rêxistinîkirî ne. Di şoreşa me de azadiya polîtîk hatiye bidestxistin.

Şoreşa me ya Rojava di warê bi hev re jiyankirina gelan de ji bo çareserîya pîrsgirêka demokrasîyê ya Rojhilata Navîn mînakeke giranbiha ye. Hêzên emperyalî û dewletên paşverû xaka me veguherandin qada şerê navbera gelan. Bi destê serdestên resmalî û faşîst şovenîzm hat belavkirin. Gel û netewan bi salan hev qir kirin. Di şoreşa me de hemû netew û komên netewî bi hev re ji dil û azad jîyan dikin. Her netew û komên netewî xwedî mafê pêşxistina çand û hebûna xwe ye. Gelê Kurd azadiya xwe ya netewî bi dest xistiye û bi gelên herêmê re jiyaneke yekpar dijî. Li hemberî êrîşên cûr bi cûr ku şkenandina vî yekitiyê hedef digirin hemû gel bi hev re têdikoşin û nîşan didin ku êdî ev lîstok nema dikarin di navbera gelan de şer derbixînin. Di heman demê de ol û bawerî jî bi azadî û bi dilxwazî bi hev re jîyan dikin û li dora şoreşa me bûne yek. Şoreşa me bi vê taybetmendîya xwe deriyê azadiyê ji gelê Kurd û gelên herêmê re vedike.

Şoreşa me ya ku ev qas destkeftî ava kiriye îro ketiye qonaxê nû. Tevî ku azadiya polîtîk hatiye bidestxistin hebûna çînen civakî, têkiliyên eşîrî û malbatî, bermayiyên hişmendîya BAAS'î, milkiyeta taybet û zilamperestiyê li ber pêşketina şoreşê ya bi lez dibin astengî. Asta hêzên hilberîner ne di wê astê de ye ku aboriyeke azad a şoreşê were avakirin. Ji ber ku çînen civakî milkiyeta xwe diparêzin, di serweriyê de jî xwedî roleke girîng in. Ev yek di nav şoreşê de li hemberî çînen serdest têkoşîna bi sepanên aborî, siyasî, çandî û dadî ferz dike.

Êrîş û dagirkeriya dewleta Tirk a mêtînger, hebûna rejîma BAAS a mêtînger, hêzên emperyalîst û hevkarên wan ên weke ENKS'ê û çeteyên paşverû gefên mezin ên li ser şoreşa me ne. Di heman demê de hebûna van hêzan pîrsgirêka demokratîkkirina Sûriyeyê ye jî. Ev hêz bi êrîşên bîrdozî, siyasî û leşgerî dixwazin azadiya ku şoreşa me bi dest xistiye ji holê rakin û deriyê azadiya gelan demeke din girtî bihêlin. Azadiya ku bindestan, jinan û netewan bi dest xistiye li hemberî hêzên resmalî, emperyalîst û paşverû gefên mezin in. Ev hêz ji ber vê ye ku li dijî şoreşa me dibin yek. Azadiya me di bilindkirina têkoşîna bîrdozî ya li dijî resmalîyê û emperyalîzmê de ye. Nazariyata welatparêziya sosyalîst di vê têkoşînê de ronîya têkoşeran e.

Destan Serhed: Em Şervan û Parezvanên Şoreşa Rojava û Bakurê Sûriyeyê Ne



Şoreşa Rojava 10'emîn salvegera xwe li pêy xwe dihêle. Li her deverên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê amadekariyên pîrozkirina 10'emîn salvegera şoreşa Rojava tên kirin. Şoreşa Rojava ya ku di heman demê de weke şoreşa jinê pêk hat di riya azadiyê de ji 10 hezaran zêdetir şehîd û ji 20 hezaran zêdetir jî birîndar û gazî danî.

Di destpêka şoreşê de ciwanên keç û xort di yekîneyên parastinê de cihên xwe girtin û xwedî li şoreşa xwe derketin. YPG û YPJ'ê bû hêza kaşker û dînamîke ya şoreşê. Di heman demê de ciwanan di avakirina şoreşê de jî roleke mezin û girîng lîstin. Di hemû kêliyên avakirinê de rol û erka ciwanên Rojava ya mezin heye.

Şoreşa Rojava bi avakirina xwe rêxistinbûyînen nû yên ciwanan jî derxist holê. Nedibû ku rêxistinbûnên berî şoreşê û piştî şoreşê bibin wekî hev. Erk, armanc û hêviyên ji ciwanan dihatin kirin, rewşa şênber a welat êdî veguherîbû. CKŞ'ê jî yek ji van rêxistinên ku şoreşa me derxistiye holê ye. Bi boneya 10'emîn salvegera şoreşê Berdevka CKŞ'ê Destan Serhed pirsên me bersivand. Em hevpeyvîne bi we re parve dikin.

Pirs: Hûn dikarin ji me re CKŞ'ê pênase bikin. CKŞ'ê çi ye û bi kîjan armancê hatiye avakirin?

Di destpêkê de ez şehîdên şoreş û azadiyê bi rêzdarî bi bîr tînim û bejna xwe li ber wan ditewînim. Em ê her dem şopdar û parezvanên xeta wan bibin.

Em weke Ciwanên Komûnîst ên Şoreşger şervan û parezvanên şoreşa Rojava û Bakurê Sûriyeyê ne. Em ciwanên Kurd, Ereb, Ermen, Tirkmen û Suryan in ku li dijî pergala kedxwarî û zilmê, li dijî zordestiya netewî, çînî û zayendî şoreş pêk anîne. Em ciwanên ku li Rojava û Bakurê Suriyeyê tarîtiya DAÎŞ'ê têk birin in. Em şopdarên şehîdên şoreşa Rojava û 33 rêhevalên xwe yên ciwan ku li Pirsusê bi destê DAÎŞ'ê hatin şehîdxistin in.

Me rêxistina xwe di 18'ê Sibata 2019'an de li Kobanê bi 2'emîn Konferansa Ciwanên Rojhilata Navîn ragihand. Rêxistina me ji bo

parastin û avakirina şoreşê bi rengê ciwan, avakirina civaka sosyalîst, bê çîn, bê zayend û bê milkiyet kar û xebat dimeşîne. Di hemû warên ku ciwan tê de jiyan dikin û dixebitin de em bi van armancan birêxistin dibin. Ango, em xelasiya civakî ya sosyalîst hedef digirin.

Pirs: Hûn dikarin ji me re hinekî behsa kar û xebatên xwe bikin?

Anha jî min got me xwe di Konferansa Ciwanên Rojhilata Navîn de ragihand. Di destpêkê de em kar û xebatên xwe li gorî perspektîf û pêdiviyên ciwanên Rojhilata Navîn rêxistin dikin. Dîsa di şerê li hemberî DAÎŞ'ê de me weke CKŞ'ê erk girt ser xwe. Endamên me di rêxistinên leşgerî de cihê xwe girtin û tevî şerê azadkirina xakên şoreşê bûn. Di hemleya rizgarkirina Baxozê de ciwanên me cihê xwe girtin. Di şerê Serê Kaniyê û Girê Spî de jî bi taybetî li Serê Kaniyê û seranserê bajarên li ser sînorê Rojava me rêhevalên xwe bi cih kirin û em tevî berxwedanê bûn. Endamên me heta roja dawiyê di parastina Serê Kaniyê de cihê xwe bernedan. Anha jî li cepheyan rêhevalên me di mewziyan de bi şervanên YPG, YPJ û QSD'ê re welatê me diparêzin.

Bi van re di warê civakî û polîtîk de jî me piştgirî da hemleya "Di komînan de birêxistin bibe, li federasyonê xwedî derbikeve", "Deriyê malên xwe ji şoreşê re veikin", "Şoreşa Xwe Biparêze". Bi van hemleyan me xwest ku em ciwanan û gelên xwe di komun û federasyonan de rêxistin bikin, şoreşê derbasî malan bikin û biparêzin.

Di salvegerên Şehîdên Pirsusê de em bîranîna wan li dar dixin. Wan xwestin ku weke ciwan werin dest bidin şoreşê, şoreşê jîyan bikin. Ciwanên sosyalîst ên SGDF'ê şoreş razber nedîtin, şoreş tişteke şênber e û wan jî ev yek baş dizanîbûn. Ji bo vê yekê xwestin werin vir û dest bidin şoreşa me lê DAÎŞ'a hov û dewleta Tirk a hevkarên wan li wir komkujiyek pêk anîn. Em wan her sal bi bîr tînin û di têkoşîna xwe de jî wan ji xwe re mînak û rêber digirin.

Dema me ev xebat dimeşandin rêhevala me Zîlan Destan (Elende El Muhamed) a ku yek ji avakera rêxistina me bû şehîd ket. Di vir de ez wê bi rêzdarî bi bîr tînim. Ji bo wê jî me du tespît kirin û ev yek ji xwe re kirin şîar. "Di riya Şehîd Zîlan de birêxistin bibe azad bibe" û "Xeyalên Şehîdên Pirsusê weke Zîlan pêşxistin û parastina şoreşê ye". Em bi van dirûşman anha kar û xebatên xwe dimeşînin.

Pirs: Ji bo jinên ciwan kar û xebatên we çi ne?

Şoreşa me di heman demê de weke şoreşa jinê ava bû. Hem ji aliyê hêzên paşverû yên cîhadî û mêtînger hem jî ji aliyê zilamperestiyê

ve şoreşa me tê xwestin ku were rûxandin. Ji bo şkenandina vîna jina ciwan şerê taybet bi dijarî tê meşandin. Di heman demê de zordestiya eşîrî, malbatî, olî û çandî ya ku li ser jinan tê meşandin li dijî şoreşa me û li dijî jinên ciwan gefên mezin in. Em li hemberî bermayî û zexta feodalî têkoşîn dikin.

Pergala resmalî di her kêliyên jîyanê de zilamperestî û kevneşopiyê gur dike. Ev jî di destpêkê de û di esasê xwe de jinê hedef digire. Jin hîn jî bi hêsanî nikarin bixebitin û qedera xwe diyar bikin. Di temenê biçûk de zewicandin hîn heye. Em van tevan dikin mijarên têkoşînê.

Ji bo ku jinên ciwan karibin di şoreşê de, di saziyên avakirin û parastinê de cih bigirin em kar û xebat dimeşînin. Di heman demê de em dixwazin ku jinên ciwan jî bi ramanên sosyalîst û xelasiya civakî û zayendî têbikoşin û rêxistin bibin. Em di xelasiya civakî û sosyalîst de xelasiya zayendî hedef digirin. Di pergala me a rêxistinî de jî ji jêr heta jor di hemû astan de jin xweser jî rêxistin dibin û di milê nazarî, polîtîk û rêxistinî de xweser in.

Pirs: Ji bo salvegera 10'emîn a şoreşê hûn çî difikirin û bangawaziya we çi ye?

Dewleta tirk a faşîst û hevkarên wê, bi hemû hêzên xwe êrîşî vê şoreşê dikin û bi hemû rêbazan dixwazin şoreşa me bin bixînin. Ji bo wê rojane bi balafirên xwe û şaneyên veşartî pêşengên me û kesayetên welatparêz hedef digirin. Dîwarên sînorên mêtînger bilind dikin û li cihên kû dagir kirine sînorên nû yên mêtîngeriyê ava dikin. Gefên dagirkeran li ser şoreşa me berdewam e û şer tu carî nesekiniye.

Di van mercan de şoreşa me ev deh sal e li ser lingên xwe disekine. Di nav van êrîş, şer û ambargoyan de şoreşa me veguherî şoreşa gelan. Pergala xwe ya serweriyê ava dike û hewil dide ku xurtir bike. Ji bo pêşxistin û parastina destkeftiyên şoreşa jinê gavên nû diavêje. Şoreşa me di van deh salan de nîşan da ku gelên Rojhilata Navîn di pergaleke demokratîk, gelparêz, azadîxwaziya jinê de dikarin bi hev re bi yekîti jîyan bikin. Şoreşa me nîşane û mînaka çareseriya pirsgerêkên Sûriyeyê û Rojhilata Navîn tevahî ye. Di şoreşa me de azadiya polîtîk hatiye bidestxistin. Di bingeha vê xurtbûnê de jî ev yek heye.

Em ê weke CKŞ'ê ji bo parastina welatê xwe û şoreşa xwe tekoşîna xwe mezin bikin û ji bo rizgarkirina xakên xwe yên hatine dagirkirin têbikoşin. Em bang li hemû ciwanan dikin, ji bo parastin û pêşxistina şoreşê, ji bo xelasiya civakî û avakirina sosyalîzmê tevî nava refên me bibin û em bi hev re şoreşê li her derê belav bikin. Ciwan pêşeroj in, pêşeroj jî sosyalîzm e!

Endamê Meclisa TKŞ'ê ya Kobanê Mirza Berxo



Despêkê dema min xwe nas kir rejîma BAAS li vir bû. Me dibistana rejîmê dixwend. Zehmet bû ji ber ku zimanê perwerdeyê Erebi bû û me nedikaribû Kurdî biaxivîya. Mamosteyan dema me zehmetî dikşand, pir li me dixistin, îşkence dikirin. Ne tenê li dibistanan li dervê jî dema em di ber navendên rejîmê re derbasdibûn me pir tirs didît. Dema me leşkerekî nîzamê didît em pir ditirsiyan. Me nikaribû dervî malê bi Kurdî biaxivîya. Dema yek li derve bi Kurdî diaxivî muxabaratê wan dişopandin. Me nikaribû zarokatîya xwe jîyan bikiraya. Me nikaribû bi rehetî bilîstaya. Çima ji ber kû em Kurd bûn. Li ser me pir zext hebû.

Hinek mirov bi rejîmê re tevdigerîyan. Tenê yên ku welatparêzî bi wan re hebû ew bi tirs tevdigerîyan. Gel pir îşkence didît. Ne ku leşkerê wan heta polîsê trafikê jî li ser millet dikaribû zehmetî derbixistaya. Dema te navê Kurdî li zarokê xwe bikiraya qebûl nedikirin û nav diguhertin. Di vî milê de millet pir îşkence, zehmetî kişandin.

Newroz ji bo Kurdan rojê pir taybet e. Em her sal agir vêdixin û pîroz dikin. Bes nîzam wê rojê nedihîşt em pîroz bikin û êrîş dikirin. Kesên ku tevî dibûn dixistin bin çav, îşkence dikirin heta kuştin jî çêdibûn. Kurd li Suriyê li ku derê hebana Newroz ji xwe re dikirin rojê azadiyê. Kar û xebatên xwe berdidan û pîroz dikirin. Nîzam dît ku nikare Kurdan bisekinîne ew roj kir rojê dayikan. Bi vî riyê xwest ku hindirê rojê vala bike. Me berî şoreşê wisa jîyan dikir.

Dema ku şoreş despê kir li Kobanê miletê me bi coş û rihekî azadîxwaz, bi rihekî fîdai tevî şoreşê bûn. Edî bi azadî bi zimanê xwe diaxivî, îşkence li ser wan rabû. Dibistanên me, mamosteyên me bûn Kurdî. Lê piştî van

tiştan dîsa li ser me pir êrîş çêbûn. Ji ber ku gel hemû dîtin li vir azadî heye. Li hemberê van pir êrîş li ser kurdan hat. Di van êrîşan de gel serî netewandin. Rihê berxwedanê her tim li ser gelê me bû. Ji zarokan bigire hemû jin, ciwan gelê me li ber xwe dan. Nedixwastin dîsa koletî, bindestî vegere. Şoreş, azadî dixwastin. Ji ber vî yekê her tim li ber xwe dan. Herkes û hemû dewletên kapîtalîst jî dîtin ku gelê kurd serkeftî ye. Dîsa jî tevgerên kapîtalîst û dagirkerî li van deran çêbûn. Dewleta faşîst û mêtînger hin axên me dagir kir.

Piştî şoreş çêbû, serkeftin çêbûn. Min got gerek ez jî di vî şoreşê de cih bigirim. Piştî ku ez bûm şoreger pir tişt di jiyana min de hatin guhertin. Ya yekemîn di aliyê zilamperestiyê de jiyana min pir hat guhertin. Berê min zilma li ser jinê nedidît, keda jinê min nedidît. Dema ez bûm şoreşger li hemberî fikir û nêzikatiya zilamperestî jî ez ketim rêya têkoşînê. Ez hem di hundirê xwe de, hem jî li derdorên xwe edî têkoşîna azadiya jinê esas digirim.

Piştî ku ez bûm şoreşger min dît ku li ser şoreşa me bandora kapîtalîzmê pir e. Min fêhm kir ku di şoreşa me de asta heyî têrê nake. Pêwîst bû ku şoreşa me derbasê asteke nû bibe. Ev ast jî asta sosyalîzmê bû. Baş e, çima ev pêwîstî hebû. Ji ber ku bi bandora kapîtalîzmê gelê me pir feqîr bûn. Ferqa zengîntî û feqîrtî zêde bû. Ji bo bandora kapîtalîzmê bişke û şoreş pêş bikeve pêwîst e zengîntî û feqîrtî ji holê rabe. Ji bo ku gel bi bandora kapîtalîzmê neyên xapandin, sosyalîzm gerek bû. Ji bo ev gotinên min pêk werin û şoreş bigihêje asta sosyalîzmê ez jî tevî tevgera komünîst bûm. Niha ez wek ciwanekî ji Kobanê di Teverga Komünîst de cih digirim û karê xwe dimeşînim. Bangawaziya min ji hemû jin, ciwan, gûndî, karker û kedkaran re ye: werin em vî şoreşê pêş bixin û bigihînin asta sosyalîzmê. Werin tevgera komünîst bila bi we re hêz bigire.

JKŞ, Şehîd Zilan Destan li ser gora wê bi bîr anî

Jinên Komünîst ên Şoreşger di salvegera yekemîn a şhadeta Zilan Destan de li Pakrewangeha Şehîd Dicle bîranînek li dar xistin.

Di bîranîna ku bi kêliyê rêzgirtinê destpê kir de Gulistan Kobanê bi zimanê Erebi daxuyaniya çapemeniyê xwend. Piştî li ser navê malbata rêheval Zilan bavê wê Ferzende El Muhammed ku mafê axaftinê girt, bal kişand ser hîlbijartina bi bîrdarî ya rêheval Zilan. Ferzende El Muhammed, diyar kir ku ew ji bo azadiya gelên bindest tevî MLKP'ê bûye û diyar kir ku rêheval Zilan yekemîn şehîda jina komünîst a ji Rojava ye û ew weke malbat bi vî yekê serbilind in.

Di axaftina li ser navê JKŞ'ê de hat diyarkirin ku rêheval Zilan bi armanca pêşxistina şoreşa Rojava û veguherandina şoreşa sosyalîst tevî partiyê bû û cihê xwe di nava refên partiyê de girt. Şehîd Zilan di têkoşîna azadiya gelê Kurd de û bi taybet di têkoşîna azadiya jinê de riyê ronî li ber jinan vekir.

Bîranîn bi dirûşmeyan bi dawî bû.



Pêşenga komünîst a Ciwanan Elende El Muhammed li Heseke hat bîranîn.

Ciwanên Komünîst ên Şoreşger (CKŞ) bi boneya yekemîn salvegera şhadeta ciwan a komünîst Elende El Muhammed (Zilan Destan) li Heseke bîranîn li dar xist.

Bîranîn li salona Reşo pêk hat û li salonê pankart û wêneyên "Di riya Zilan Destan de rêxistin bibe azad bibe" hatin daliqandin.

Nûnerên saziyên şoreşger beşdarî bîranînê bûn. Bîranîn di şexsê Zilan Destan de bi deqîqeyek rêzgirtinê dest pê kir. Piştî awaza "Dilşa" ya ji bo bîranîna Zilan Destan hatiye çêkirin hat guhdarîkirin. Li ser navê CKŞ'ê Destan Serhed axivî û diyar kir ku Elende El Muhammed weke jineke ciwan a ji Kobanê teslîmî zehmetiyên ku jiyaye nebûye û rêxistinbûyîna xwe hîlbijartiyê. Destan Serhed, anî ziman ku ew yek ji wan kesên ku dikare bêje "Jiyana berxwedan e" û



got ku Elende El Muhammed ji çiyayên azad heta parastina şoreşa Rojava gelek karên şoreşgerî girt ser milên xwe.

Destan Serhed da xuyakirin ku Elende El Muhammed li dijî şerê taybet ê li dijî ciwanan têdikoşiya. Destan Serhed wiha domand: "Em îro bi têkoşîna Zilan Destan û yên wekî wê li vir in. Em weke CKŞ'ê şopdarên riya Zilan Destan in."

Li ser navê TKŞ'ê Cemil Sîdo axivî û diyar kir ku ew ê têkoşîna Elende El Muhammed heta serkeftinê bimeşînin û soza xwe ya bi bîranîna wê dubare kir. Sîdo bi bîr xist ku di demên dawî de gefên dagirkeriyê yên dewleta Tirk zêde bûne û destnîşan kir ku girîngiya têkoşîna li dijî dagirkerî û mêtîngeriye zêde bûye. Li dijî êrîşên dagirkeriyê banga yekitiya li dêdora saziyên şoreşê kir. Sîdo bang li gel kir ku ji bo azadî û şoreşê li dijî kapîtalîzmê têbikoşin.

Bîranîn bi dirûşmeyên "Şehîd Namirin" û "Zilan Destan Namire" bi dawî bû.



NAVENDA ZÎLAN DESTAN HAT VEKIRIN



Ciwanên Komûnîst ên Şoreşger (CKŞ) Di 1'emîn salvegera şehadetê de Zîlan Destan (Elende El Muhammed) bi bîr anîn Navenda Zîlan Destan a Çandê vekirin.

Li Taxa Xerbî li pêşiya navenda çandê çalakiya vekirinê bi rêzgirtinê dest pê kir. Destan Serhed li ser navê CKŞ'ê axivî û li ser jiyana Elende El Muhamed agahî dan. Destan di axaftina xwe de got "Zîlan Destan ji bo kiryarên pergala kapîtalîst ên zilamperest bi kûrahî jiyana kiriye xwesteka wê ya şoreşgertî pir mezin bû. Li tevahî bajarên Rojava, li her taxakê, li her malekê di dilê her jineke ciwan de cih girt. Zîlan Destan li dijî şerê taybet ê ku li ser ciwanan tê meşandin jî têkoşîn kir. Bi vî û cesareta xwe ji bo ciwanan mînak afirand, em hemû ciwan şopdarên Zîlan Destan in"

